

Komeke din dest bi grevê kir

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven bi daxwaza tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were bidawîkirin 50 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Her wiha li gelek girtîgehên bi giştî 42 girtî di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Li bajarê Starsboûrgê ya Fransaya greva birçîbûnê di roja 11'emîn de dewam dike.

Berxwedana greva birçîbûnê pêl bi pêl mezin dibe. Duh li girtîgehên Kiriklar, Şakran, Sîncan, Duzce û Kirikkaleyê bi giştî 23 girtiyan ji bo tecrîda li ser Ocalan were rakirin dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kirin. Her wiha li Girtîgeha Tîpa T ya Burhaniye ya Balikesîrê, 4 girtiyan jin destnîşan kirin ku bi heman armancê 8 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ne... RÛPEL - 3

@rojname

27 Kanûn - Pêncşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 217

Ji bo qeydan 4 roj man



Ji bo çêkirina cihê qeyda dengên a hilbijartina herêmî tenê 4 roj man. Endamê Komîsyona Hilbijartinê ya HDP'ê Êlihê Necmî Dîlmaç ji bo çêkirina qeyda cihên dengên xwe bi kar bînin bang li hemû kesî kir ku heta 31'ê kanûnê her kes biçe midûriyeten nifûsê serlêdanên xwe bikin û cihên dengên xwe çêbikin û dengê dikare encamê biguherîne.

Bila qirkerin dubare nebe



Lijneyê mohreke reş li helbesta kurdî xistiye

Têkildarî Pêşbirka Helbestan a Arjen Arî nîqaş dewam dikin. Nivîskar Yıldız Çakar diyar kir ku Narîn Yukler bi kurdî nîzane, haya li jineyê ji vê yekê heye û li jineyê bi vê biryarê mohreke reş li helbesta kurdî xistiye. Organîzatorê pêşbirkê Reşo Ronahî jî diyar kir ku li jineya wan piştrast kiriyê ku çend helbestên Yukler werger in û li gel vê yekê jî pêwîstî bi betalkirinê nedîtine... RÛPEL - 6

HEVKARIYA TIRKIYÊ Û ÇETAYAN

Dîroka dewleta tirk bi dagirkerî, qirkerin, talan û diziyê tije ye. Hemû deverên ku aramî lê hebûye wek metirsi dîtine û komkujiyên mezin pêk anîne. Dewleta tirk dixwaze bi serkêşiya serokê AKP'ê Tayyîp Erdogan û bi alîkariya çeteyan li bakurê Sûriyeyê komkujiyên nû pêk bîne.

DIVÊ QADA HEWAYÎ BÊ QEDEXEKIRIN

Li bakurê Sûriyeyê herêmên ku ji aliyê dewleta tirk û çeteyan ve hatine dagirkerin zilm û zordarî heye. Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê bang li saziyên navneteweyî kir ku pêşî li komkujiyên nû bê girtin û divê qada hewayî ya bakurê Sûriyeyê bê qedexekirin... RÛPEL - 3



Navnîşana jinan a 31'ê adarê HDP ye

Di 18'yê kanûnê de serlêdanên namzetiyê bi dawî bûn û li avahiya HDP'ê Wanê jî bendewariya bi kelecana didome. Jinên ji bo hilbijartina herêmî serlêdana namzetiyê kirin anîn ziman ku HDP ji ber partiya jinan e serlêdan kirine. Medîne Tufan ya ji bo namzetiya Meclisa Şaredariya Elkê serlêdan kiriyê diyar kir ku ji ber HDP girîngiyê dide jinan wê serlêdan kiriyê... RÛPEL - 2

Dewleta tirk di lîsteya welatên qirker de ye

Projeya Hişyarkirina Zû ya ku bi piştgiriya Muzeya Bibîranîna Holokostê ya DYAyê tê birêvebirin, di destpêka sala 2019'an de şerê li welatan li pêş çavan girt û nixandineke berfireh weşand. Li gorî vê lîsteyê, Tirkiye ya ku bi 'demokrasi û azadiyê' pesnê xwe dide, di nav welatên ku dikarin qirkerinê pêk bînin de, ket nav 10 welatên rêza pêşîn. RÛPEL - 4

Hikûmeta AKP'ê li Roboskê komkujî pêk anî



Di 28'ê kanûna 2011'an de li gundê Roboskê yê navçeya Qilebana Şîrnexê, di encama bombebarana balafirên şer ên artêşa tirk de piranî jê zarok 34 welatî bi hovane hatin qetilkirin. 7 sal di ser qetlîamê re derbas bûn lê hêj kiryan û berpirs nehatine darizandin. Hemû sozên bi boneya kiryan derxin holê dan malbatan jî bi cih nehatin. Çape-meniya tirk komkujî veşart û serokê AKP'ê Tayyîp Erdogan wê demê xelat da kujerên Roboskê. Hevserokên HDP'ê ji parlamentê berê yê girtî Ferhat Encu re name şandin û gotin dê ji bo darizandina kujeran têkoşinê bidomînin... R - 3



Li Sûdanê 37 kes hatin qetilkirin

Roja sêşemê bi hezaran kesên li Xartum a paytaxta Sûdanê kom bûn û xwestin serokê Sûdanê Omer Beşîr îstîfâ bike ber bi qesra seroktiyê ve meşyan. Karbidestên ewlekariyê bi hovane êrîşî çalakgeran kirin. Rêxistina Lêborîna Navneteweyî (Amnesty International) ragihand ku li Sûdanê herî kêm 37 kes, ji aliyê karbidestên ewlekariyê ve hatine kuştin... RÛPEL - 4



Bi yekitiya gelan dê êrîş têk biçin

Li bakurê Sûriyeyê kurd, ereb, tirkmen û suryan bertek nîşanî gef û êrîşên dewleta tirk didin. Li Minbicê tirkmenan têkildarî gefên dagirkeriyê daxuyanî da û diyar kirin ku dê li dijî êrîşan bajarê xwe biparêzin û dê bi yekitiya gelan êrîşan têk bibin.



Jinên kurd ên li Parîsê ji Guven re name şandin

PARÎS - Hevseroka KCD'ê Leyla Guven re ku ev 50 roj in ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di çalakiya greva birçibûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Meclisa Jinê ya Ekin Wan a li herêma Villeneuve Saint George ya li paytexta Fransa Parîsê ji bo piştigiriya bi çalakiya Leyla Guven

re di çarçoveya kampanyaya 'Tu jî nameyekê binivîse' de jinên kurd ên li Parîsê jê re name şandin. Di nameyê de ev tişt hatin gotin: "Çalakiya we çalakiya me ye. Berxwedana we, berxwedana rûmeta me ye. Em wek jinên kurd ên li diasporayê dê her tim bi te re bin."

Divê jin perwerdeya xwe bidomînin



Endma Komîteya Perwerdeya ya Kongreya Starê Rihan Temo der barê xebatên komîteyê yê sala 2018'an de nixandî kir.

Temo diyar kir ku jin ji serê sala 2018'an heta niha ji bo perwerdeyê têkoşînek mezin dane û wiha got: "Xebatên ku di sala 2018'an de hatin meşandin ji bo çareserkirina pirsgrîkên jinan û rola wan a di nav şoreşê de girîng bûn. Ji bo bigihîjin hemû jinan em di nav hewldanek mezin de bûn."

Endama Rêveberiya Komîteya Perwerdeyê ya Kongreya Starê Rihan Temo der barê xebatên perwerdekirina jinan de axivî û destnîşan kir ku di sala 2018'an de bi hezaran jin hatine perwerdekirin

Piştî kongreyê xebatên girîng

Temo di axaftina xwe de bal kişand ser kongreya heftemîn a Kongreya Starê û wiha domand: "Di destpêka sala 2018'an de li gorî sîstema Kongreya Starê wek komîte me xebatên xwe kirin. Lê ji ber perwerde ji komîteyên herî girîng ên Kongreya Starê, piştî kongreya heftemîn me xebatên xwe li ser asta kanton, navçe û bajarokan, ji komunan heta asta herêman meşandin."

Gihîştin armanca xwe

Temo destnîşan kir ku ew di sala 2018'an de gihîştine armanca xwe û wiha pê de çû: "Çimkî bi hejmarek mezin jin hatin perwerdekirin. Di asta komun û meclisên Kongreya Starê de

6 hezar û 992 jin, ji bo jinên civakê û saziyan 18 dewreyên vekirî û girtî ku di nav de 500 jin hebûn, ji endamên mala jinê hezar û 13 jin, hatin perwerdekirin. Her wiha jinên ku di saziyan de cih digirin her hefte perwerdeya xwe ditin. Bi sedan jin hatin perwerdekirin, bi giştî 8 hezar û 541 jin di vê salê de hatin perwerdekirin."

Tu tişt nebû asteng

Di berdewama axaftina xwe de Temo da zanin ku tevî hemû şert û mercên diwar û tevî hemû gef û êrîşan li ser jinên Rojava û bakurê Sûriyeyê van tiştan li pêşîya perwerde û birêxistinkirina xwe asteng nedîtine û wiha axivî: "Her wiha bêyî ku em cu-

dahiye bixin nav nijadan, bi sedan jinên ereb jî hatin perwerdekirin. Di çarçoveya fikra ku jin bikaribin xwe bi rêxistin bikin û bibin xwedî hêz de perwerde hat dayîn. Li dijî zihniyeta baviksalari xwerêxistinkirin girîng e."

Divê mîr jî bîn perwerdekirin

Her wiha Temo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo di sala 2019'an de planên me yê berfireh hene, têkoşîna û xebatên me di asteke bilindtir de dê werin meşandin. Ji bo guhertin di nav civakê de pêk were divê mîr jî bîn perwerdekirin. Em hêvî dikin ku di sala nû de zêdetir jin bîn perwerdekirin. Jin ji bo xwe perwerde bikin her tim têdikoşin." **QAMISLO**



Dê ji bo pêşxistina jinan bixebitin

Akademiya Jinên Sûriyeyê ya Reqqayê bi armanca perwerdekirina jinan dewreya perwerdeyê vedike. Heta niha akademiya 8 dewreyên perwerdeyê bi dawî kirine.

Girêdayî mijarê jinên ku tev li dewreyê bûne, destnîşan kirin ku armanca wan ew e ku mafên jinan li ser bingeha neteweya demokratîk bêhtir nas bikin.

Hind Mistefa diyar kir ji bo ku ew bêhtir mafên jinan bi tabetî li ser rêgeza neteweya demokratîk û pêkanîna wekheviyê di civakê de nas bike, tev li dewreya perwerdeyê bûye û wiha got: "Ji bo pêkanîna azadiya tevahiya jinên Sûriyeyê em ê bi hev re bixebitin."

Jin mafên xwe nas kirin

Mardî Elêwî anî ziman ku di dewreyê de wê mafên jinan di civakê de û rola wê di avakirina civakeke demokratîk û azad de bêhtir nas kiriye û wiha axivî: "Li gorî waneyên me di dewreyê de ditine, ji bo azadiya jinan û bicihanîna mafên wê di hemû warên jiyana de ez ê bixebitim." Di heman mijarê de Îtîmad Ehmed jî ev tişt anî ziman: "Çeteyên DAÎŞ'ê ji mafên me, em bepar hiştin. Lê niha piştî ku em azad bûn, em ê xwe pêş bixin û tevahiya jinan bi rêxistin bikin. Ji ber wê divê tevahiya jinên herêmê tev li dewreyan bibin." **REQA**

Hedefa jinan şandina qeyûman û bidestxistina deskeftiyane

Di 18'yê kanûnê de serlêdanên namzetiyê bi dawî bûn û li avahiya HDP'a Wanê jî bendewariya bi kelecana didome. Jinên ji bo hilbijartina herêmî serlêdana namzetiyê kirin diyar kirin ji ber HDP partiya jinan e serlêdan kirine.

Medîne Tufan ya ji bo namzetiya Meclisa Şaredariya Elkê serlêdan kiriye diyar kir ku ji ber HDP girîngiyê dide jinan ew serlêdan kiriye û wiha got: "Min di gelek xebatên HDP'ê de cih girt. Li navçeyê me jin bi rehetî dernakevin derve. Cihê ku rehet lê bigerin tune ye. Şaredariya DBP'ê gelek xebat ji bo jinan meşandin. Lê piştî qeyûm jin hepsê malê bûn."

Tufan anî ziman ku bi qeyûm re qada jiyana jinan zêdetir teng bûye û got ku hedefa wan ew e ku qeyûm şûnde bişînin û ji nû ve xebatên xwe bi hev re bikin.

Her wiha Hariye Ozlu ku ji bo encumeniya şaredariya Westanê serlêdan kiriye jî da zanin ku ji bilî HDP'ê kes girîngiyê nade jinan û wiha axivî: "Divê tu jin xwe sînor neke. Bila her kes tev li HDP'ê bibe. Dema diçin ser sindoqê jî bila dengên xwe bidin HDP'ê." **WAN**



Berxwedan dê heta serkeftinê bidome

Li herêma Şedadê ya kantonê Heşekê bi dehan şervanên ereb piştî perwerdeya derweya bi navê Şehîd Berfîn tev li şervanên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) bûn. Dewreya ku te de dersên bîrdozî û leşkerî hat dayîn, 40 rojan berdewam kir.

Merasima girtina dewreyê bi deqeyê rêzgirtinê dest pê kir. Piştî wê fermandara YPJ'ê Leyla Waşokanî girtina dewreyê li şervanên pîroz kir û wiha got: "Em bidawîbûna vê dewreya perwerdeyê li hemû jinan û li gelê xwe pîroz dikin. Di nav vê pêvajoya awarte

de bi dawî kirina perwerdeyê serkeftinek mezin e û em bawer in ku her şervanek li cihê biçê de dê bi erk û berpirsyariyên demê rabe."

Fermandar di axaftina xwe de bal kişand ser gefên dewleta tirk a dagirkirina bakur û rojhilata Sûriyeyê û ev tişt anî ziman: "Em wek Yekîneyên Parastina Jin, her dem amade ne ku gelê xwe biparêzin. Em wekî jin û gelê Rojhilata Navîn li ser çanda berxwedaniyê mezin bûn û em ê vê çanda xwe heya serkeftinê bidomînin in."

Piştî şervanên soz dan ku dê welatê xwe û xaka xwe heya serkeftinek mayînde biparêzin, merasima leşkerî bi dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' bi dawî bû. **HESEKÊ**



Nûnerên saziyên jinan çûn serdana karkeran

Nûnerên saziyên jinan ên Stenbolê û parlamentera HDP'ê ya Enqereyê Filiz Kerestecioglu, karkerên jin ên Flormarê yê li Gebze ya Kocaeliyê 227 roj in ji bo parastina mafê xwe di çalakiyê de ne ziyaret kirin. Di ziyaretê de pankartên 'Ne Flormar, berxwedan xweşik dike', 'Flormar bi berxwedanê mezin dibe' û 'Berhemên Flormarê boykot bike' vekirin.

Li vir parlamentera HDP'ê Filiz Kerestecioglu diyar kir ku karkerên Flormarê berxwedanek mezin nîşan didin û wiha got: "Tiştê ji destê me tê em têkoşîna we li meclisê bidin xuyakirin û dengê we li meclise bilind bikin. Jinên karkerên Flormarê li vir berxwedanek xweşik û mezin nîşan didin. Em û rêxistinên jinan bi hev re hatin. Heta ku ev berxwedan hebe dê karker li her derê mafên xwe bi dest bixin."

Piştî axaftina Kerestecioglu jinan bi stranên govend gerandin. **STENBOL**

Divê jin di hemû merheleyên rêveberiya herêmî de cih bigirin

Li Tirkîyeyê tevî partiyên siyasî, li tax û gundan jî gelek kes ji bo keyatiyê amadekariyên xwe yê hilbijartina herêmî ya 31'ê adara 2019'an dikin. Li gorî daneyên Komeleya Keyayên Tirkîyeyê 31 hezar û 963 jê tax û 18 hezar û 329 gund

bi giştî 50 hezar û 292 keya hene. Ji van keyayan tenê 674 jê jin in. Yek ji van keyayên jin jî keyaya ewil a gundê Akdikê e navçeya Pulumira Dêrsimê Perihan Pekîn (49) e. Wexta Pekîn dibe keya pirsgrîkê di warê ceyran, av û rê de

yên gund çareser dike û niha jî hewl dide di hilbijartina herêmî ya 2019'an de careke din bibe namzet.

Pekîn anî ziman ku di sala 2014'an de xizmetên wê jê xwestine ji bo keyatiyê bibe namzet û wiha got: "Ev pêşniyar ket serê min. Paşê min ji xwe re got çima nebe. Ma çiyê min jî zilaman kêm e. Her tişt jî destê min tê û min serî lê da."

Pekîn diyar kir dema di 2014'an de ew bûye namzet gelek kesan gotiye 'Çawa çêdibe dê jinek bibe keyaya gund? Wê çawa bikaribe bike? Nikare. Em naxwazin' lê wê guh nedaye tu kesî û bi keyatiya xwe bûye bersiva herî mezin û wiha domand: "Her wiha divê jin tenê ne ji bo keya-

tiyê, di hemû qadan de serkeftî bin. Jin dikare giha jî bidirû, dikare parlementerî, şaredariyê û dikare keyatiyê jî bike. Em li hemû qadên jiyana ne. Tenê bila jin bixwazin, bila xwe nedin eciqandin. Her ku em bêdeng dibin, em tên paşguhkirin. Ev jî şaşiya me ye. Divê jin bêdeng nebin. Divê têbikoşin û mafên xwe biparêzin."

Her wiha Pekîn destnîşan kir ku di hilbijartinên herêmî yê 2019'an de li Dêrsimê jî bo keyatiyê hejmara namzetên jin zêde bûye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Her keyayeke jin, wêrekîyê li gelek namzetên jin peyda dike. Divê jin di hemû merheleyên rêveberiya herêmî de bi temsiliyeteke wekhev cih bigirin." **DÊRSIM**



Xêzkirina wêneyan sûc tê hesabandin



AMED - Li girtîgehên binpêkirinê mafan û zextên li hemberî girtiyan roj bi roj zêde dibin. Li Girtîgeha Tîpa M ya Bayburtê ku her tim bi binpêkirina mafan tê rojevê, zextên li ser girtiyan bi dawî nabin. Leyla Saraç a girtî bi rêya parêzerê xwe agahî da. Saraç diyar kir ku demek dirêj e nameyên wan nayên şandin û wiha got: "Nameyên ez dişînim ji malbat û hevalên xwe re ji komîsyona xwendinê vedigerin. Hincet ji wêneyan ku min xêz kirine û xistine zerfê, nişan didin. Xêzkirina wêneyan wek sûc tê dîtin."

Daxuyani hat astengkirin



STENBOL - Şaxa Komeleya Çanda Pir Sûltan Abdal (PSAKD) a Stenbolê, xwest ji bo nûnerên sazîyên elewî, rêveber û xebatkarên TV 10 a bi KHK'ê hat girtin ku nêzî salekê ye girtiye, li ber Kampusa Girtîgeha Sîlvîriyê daxuyani bide çape-meniye lê cendirmeyên li ser girtîgehê destûr nedan PSAKD'ê ku daxuyani bide. Kameravanê TV 10'ê Kemal Demir ji 2'yê Kanûna 2017'an, serokê Desteya Rêveberê TV 10'ê Velî Buyuqşahî, bemaameker Velî Haydar Guleç ji 18'yê çileyê ve û seroka PSAKD'ê ya Sariyerê Zeynep Yıldırım ji 26'ê tîrmehê ve li Girtîgeha Sîlvîriyê girtine.

170 roj in li ber xwe didin



AYDIN - 9 karkerên ku di otobûsên Şirketa Anonîm a İmarê ya girêdayî Şaredariya Bajare Mezin a Aydinê de ajokarî dikirin û ji kar hatin avêtin, ji bo mafên xwe bistînin 170 roj in di çalakiyê de ne. Karkerên ku bi sedema nebûne endamên Sendikaya Belediye İş'e ya Türk-İşê û li şûna wê bûne endamên Sendikaya Sosyal İş a DİSK'ê ji kar hatin avêtin, diyar kirin ku heta dawiyê dê çalakiya xwe bidomînin.

Bav û kur hatin girtin



ŞIRNEX - Li taxa Cûdî ya navçeya Silopiya ya Şirnexê, Necmettin Ormanlı û kurê wî İzzettin Ormanlı du roj berê di serdegirtina malê de hatin binçavkirin. Necmettin Ormanlı û kurê wî İzzettin Ormanlı yê li Midûriyeta Polîsan îfade dan, sewqî dozger hatin kirin. Dozger bi daxwaza girtinê bav û kur wî sewqî dadgehê kirin û hatin girtin. 2 kesên şandin Girtîgeha Tîpa T ya Şirnexê, hinceta girtina wan nehat zanin.

Çalakî bi tevlibûnên nû mezin dibe

Çalakiyên grevên birçibûnê yê bêdem û bêdorveger ên ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan hatine destpêkirin pêl bi pêl mezin dibin. Di vê çarçoveyê de li gelek girtîgehên 23 girtî dest bi grevê kirin û girtiyan diyar kir ku heta rakirina tecrîdê dê çalkiya xwe bidomînin

Ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, tevî hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê Leyla Guven, li gelek girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê ji girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê ketin greva birçibûnê ya bêdem û bêdorveger.

Di vê çarçoveyê de li Girtîgeha Jinan a Sincanê 3 girtî ; li Girtîgeha Jinan a Şakranê, li Girtîgeha Jimar 1 û 2 yê Tîpa F a Kiriklarê û li Girtîgeha Jimar 2 ya Tîpa T ya Şakranê jî 13 girtî; li Girtîgeha Tîpa T a Duzceyê 2 girtî û li Girtîgeha Tîpa F a Kirikkaleye 5 girtî dest bi greva birçibûnê ya bêdem û bêdorveger kirin.

Li Girtîgeha Jinan a Sincanê 3 girtiyên jin ên bi navê Suheyla Taş, Zeliha Ustabas û Salîha Taşkesen ketin greva birçibûnê ya bêdem û bêdorveger. Girtiyan da zanin heta ku tecrîd bi dawî bibe dê çalakiya xwe bidomînin.

Li Girtîgeha Jinan a Şakranê, li Girtîgeha Jimara 1 û 2 yê Tîpa F a Kiriklarê û Girtîgeha Jimar 2 ya Tîpa T ya Şakranê jî 13 girtiyên bi navê Abdullah

Oral, Erdal Polat, Samî Oztürk, Halîs Daghan, Ozan Alpkaya, Mehmet Durak, Nihat Ekmez, Yakup Guneş, Tanju Yıldırım, Ramazan Atabay, Rahşan Aydın, Gulden Akgul û Ebru Guden ragihand ku ew jî ji bo rakirina tecrîdê dest bi greva birçibûnê ya bêdawî û bêdorveger kirin.

Bi heman armancê li Girtîgeha Tîpa T ya Duzceyê girtiyên siyâsî Mehmet Erbey û Suleyman Benzer jî ragihand ku wa jî dest bi greva birçibûnê ya bêdawî û bêdorveger kirin.

Her wiha li Girtîgeha Tîpa F a Kirikkaleye girtiyên bi navê Sedat Alçiçek, İsa İpeklî, Emrah Ubiç, Kerem İmrak û Davut Onder dest bi grevê kirin û girtiyan anî ziman ku heta tecrîd bi dawî bibe dê çalakiya xwe berdewam bikin.

'Em ê bi ser kevin'

Li hêla din, li Girtîgeha Tîpa T ya Burhaniye ya Balikesîrê, 4 girtiyên jin ên bi navên Figen Şahin, Emîne Kiliç, Gulistan Tekin û Çiğdem Şakar 7 roj in



di greva birçibûnê ya bêdem û bêdorveger de ne. Figen Şahin bi rêya telefonê bi xwişka xwe Nûrgül Tûrhal re ev tişt got: "Rewş û moralê me baş e. Ji ber ku me jî ev ala serkeftinê hildaye, em pir bi coş û kêfxweş in. Em jî dil bawer dikin ku em ê bi ser kevin. Dê sala nû bibe sala berxwedana me." **AMED**

Erka her kurdek ew e ku xwedî li Ocalan derkevin

Çalakiyên greva birçibûnê ku ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan hatine destpêkirin didomin.

Kurdên li navçeya Novovaleksandrovkî ya bajarê Stavrapolê Rûsyayê, 3 roj in li dijî tecrîdê di greva birçibûnê de ne. Çalakî ji aliyê Otonomiya Çanda Kurd a Novovaleksandrovkî ve tê organîzekirin. Ji beşdarên çalakiyê hevserokê otonomiyê Huseyin Ahmedov daxuyaniyek da û wiha got: "Êrişeke topyekûn li dijî gelê kurd heye. Plana destpêkê ya vê êrişê jî tasfiyekirina Ocalan e. Ev komploya gemarî dewama komploya navneteweyî ye. Gelê kurd bi tekoşîna xwe dikare vê komplojê jî pûç bike."

Çalakiya greva birçibûnê ku di 16'ê kanûnê jî aliyê welatiyên

Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) ve hatiye destpêkirin jî didome. Welatiyên ku tev li grevê bûne diyar kirin ku heya ew agahî ji Rêberê xwe negirin dê çalakiya xwe bidomînin û dan zanin ku beşdarbûna çalakiyan erka welatparêziyê ye.

Ji aliyê din ve çalakiya ku Komeleya Karkerên Mezopotamya ya Silêmaniyeyê hatiye destpêkirin di roja xwe ya

13'emîn de û çalakiya ku Nûner-tiya HDP'ê ya Hewlêrê daye destpêkirin jî di roja xwe ya 37'emîn de didome.

Her wiha welatiyên Gemiyanê jî têkildarî tecrîda li ser Ocalan axivîn û anîn ziman ku tecrîda li ser Ocalan li dijî hemû kurdan e. Welatiyan gotin ku erka hemû kurdek ew e ku xwedî li Ocalan derkevin û ji bo azadiya Ocalan tekoşîna bilind bikin. **STAVRAPOL - SILÊMANÎ**



Têkoşîna darizandina kujeran dê bidome



Hevserokên HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temelli ji bo salvegera 7'emîn a Komkujiya Roboskê nameyek ji nûnerê gelê Roboskê û wekilê HDP'ê yê girtî Ferhat Encu re şand.

Di nameyê de kesên ku di Komkujiya Roboskê de hatibûn qetilkirin hatin bibiranin û hat gotin ew êşa malbatan parve dikin.

Hevserokan diyar kir ku hişmendiya ku ji bo komkujiyên berê yê komarê re gotiye 'Hewcedariyêke dîrokî' ji bo komkujiya Roboskê gotiye 'Bivenevê' û ev komkujiya ku ji hêla rêveberên Tirkîyeyê û failên komkujiyê ve hatî kirin, piştî komkujiya kurdan malavayî li hev kirine û diyarî dane hev. Di nameyê de hat destnîşankirin ku dê nikaribin Komkujiya Roboskê bi 'Qezayêke bivenevê' bi nav bikin û ev tişt hat gotin: "Têkoşîna me ya heqî û azadiyê, tekoşîna me ya jiyana bi rûmet û aştiyê bi teqezî rojekê dê heqîqetan ronî bike. Her çî jî bikin dê nikaribin ser vî sûcî ku li dijî mirovahiyê kirine binuxumînin."

Her wiha hevserokan da zanin ku heta berpîsên komkujiyê werin darizandin dê tekoşîna bidomînin. **ENQERE**

'Dewleta tirk ji bo cîhanê gef e'

Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tîkildarî geşedanên dawî, gef û êrişên dewleta tirk û biryara vekîna DYA'yê ya ji Sûriyeyê, li navenda xwe ya li Eyn İsa ya Girê Spî daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de hat gotin ku di destpêka şerê li Sûriyeyê dewleta tirk bi rêya pergala xwe, terora li hemû deverên cîhanê kom kir û wiha pê de çû: "Ev kes jî derbasî Sûriyeyê kirin. Ev terora ku desteka xwe ji pergala Tirkîyeyê digire, piraniya sinorê bi Tirkîyeyê re kontrol kir. Vê terorê xwest ku Kobanê jî dagir bike lê şervanên YPG û YPJ'ê bersiv dan û gelê Kobanê nehişt ku terora berkeve. Li vir jî şikan-dina DAİŞ'ê dest pê kir û piştî Kobanê

gelek herêm hatin rizgarkirin."

Di daxuyaniyê de Mehbaş diyar kir ku bi hevkarîya hêzên koalîsyon û HSD'ê li dijî terorê gelek destkeftî hatine bidestxistin û li herêmê aramî çêbûye û gel vegeyriya xwe ser axa xwe.

Biryar xizmeta terorê dike

Her wiha Mehbaş ragihand ku ji ber ewlêhî û aramiya li bakur û rojhilatê Sûriyeyê gelek koçberên ji herêmê di bin kontora 'Mertalê Firatê', İdlîb û rojhilatê Hemayê û Sexnê tînan herêmê û daxuyaniya wiha bi dawî bû: "Hinek alî bi zanebûn gotegotên weke 'ereb tînan koçberkirin' belav dikin. Em bersiva wan didin û dibêjin ku hûn girêdayî Tirkîyeyê ne û cîhê we derew û

fitne ye. Erdogan bi rêya dagirkirina xaka Sûriyeyê, dixwaze xeyalên xwe pêk bîne. Niha derdora 2 hezar û 622 DAİŞ'iyên biyanî yê girtî hene. Ger Tirkîyê êriş bike, dibe ku em nekarînan wan kontrol bikin û ev kes careke din vegeyriya bakurê ku jê hatine. Ev jî ji aştiyê cîhanê gef e. Em bang li NY'ê û rêxistinên mafên mirovan dikin ku bi erka xwe rabin û rê li ber dagirkeriya dewleta tirk bigirin. Dîrok şahidê rêjîma faşîst e ku komkujiyê der heqê gelê ermen de pêk anî. Ji bo careke din komkujiyê pêk neyên, divê di çarçoveya qanûnê navneteweyî de qedexeya firîna balafirên li ser van herêman bê ferzkirin û parastina gelên bakur û rojhilatê Sûriyeyê bê kirin." **GIRÊ SPI**

Leyla Guven nehat berdan

Danişîna 4'emîn a doza hevseroka KCD û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven li 9'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin. Guven ji ber bertekên wê yê li dijî dagirkeriya dewleta tirk a li Efrînê, daxuyani û xebatên wê yê di KCD'ê de tê darizandin û di 31'ê çileyê de hatibû girtin. Guven ji 25 salan heta 46 sal û nîvan bi cezayê girtîgehê tê darizandin.

Guven a ku ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev 50 roj in di greva birçibûnê ya bêdem û bêdorveger de ye, tev li danişînê nebû.

Serokê dadgehê hatibû guhertin û di danişînê de bi hinceta 'rewşa delîlên heyî' xwest ku rewşa girtî ya Guven bidome. Di danişînê de parêzera Guven, Reyhan Yalçındag jî dadgehê xwest ku daxwaza parêzerên ku dixwazin Guven biparêzin, di girtikan de bê nivîsandin. Serokê dadgehê jî navê parêzerên li salonê diminin derbasî girtikê kir lê dîre got dê dadgeh biryar bide kîjan parêzer parastinê bike. Heyeta dadgehê diyar kir ku li gorî madeya 49'emîn herî kêm tenê 3 parêzer dikarin parastina sûcên karên rêxistinê bikin û daxwaza parêzeran red kir.

Hiqûqa dubend

Yalçındag jî daxuyand ku ji destpêka dozê ve pîvana darizandina adilane hatiye binpêkirin û wiha domand: "Ne tenê Guven, her wiha İdrîs Balûken û siyasetmedarên din jî tînan darizandin. Ev dosya ne hiqûqî, siyasî ye. Dadgeh bi erka tunekirina siyaseta kurd radibin. Em ê di vê mijarê de serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) bidin"

Di danişînê de serokê Baroya Amedê Cihan Aydın jî bal kişand ser Biryarnameya Di Hukmê Qanûnê (KHK) de û destnîşan kir ku îdiyên der barê Guven di çarçoveya karên rêxistinê de nînin. Parêzer Cemile Tûrhallî Balsak û Şivan Cemil Ozen jî xwestin ku mexdûriyeta hiqûqî ya ku rê li ber hatiye vekirin, ji holê bê rakirin. Heyeta dadgehê bi hinceta "gumana xurt a sûc" biryar da ku Guven girtî bimîne û danişîn taloqî 25'ê çileyê 2019'yan kir. **AMED**



Noel bû cejna fermî ya Iraqê

BEXDA - Hikûmeta Iraqê roja 25'ê meha kanûnê, wek roja cejna Noelê bi awayekî fermî qebûl kir. Ev roj wek roja bûyîna Hz. Îsa tê pejiirandin. Roja Noelê ne tenê ji bo mesîhiyên Iraqê her weha ji bo hemû iraqiyan bû betla-

neya fermî. Zagona ku di vê babetê de hatibû amadekirinê ji aliyê serokwezîr Adil Abdulmehdî ve hat îmzekirin. Hikûmeta Iraqê di ser hesabê xwe yê fermî twitterê de bi zimanê îngilîzî vê biryarê ragihand.

Tirkiye yek ji welatên dikarin qirkirinê bike ye

Projeya Hişyarkirina Zû ya ku bi piştgiriya Muzeya Bibîranîna Holokostê ya DYA'yê tê birêvebirin, di destpêka sala 2019'an de şerê li welatan li pêş çavan girt û nixandineke berfireh weşand. Di nixandîna de lîsteya welatên îhtîmala qirkirinê li wan heye jî hat diyarkirin. Tirkiye jî di lîsteyê de di nav 10 welatên pêşîn de ye

Projeya Hişyarkirina Zû ya ku bi piştgiriya Muzeya Bibîranîna Holokostê ya DYA'yê tê kirin, di destpêka sala 2019'an de şerê li welatan li pêş çavan girt û nixandineke berfireh weşand. Li gorî vê lîsteyê, Tirkiye ya ku bi 'demokrasi û azadiyê' pesnê xwe dide, di nav wan welatan ku dikarin qirkirinê pêk bînin de ket nav 10 welatên pêşîn.

Rayedaran di çarçoveya projeyê de fikrên xwe diyar kirin û bal kişandin ser vî tiştî ku bi qetilkirina demokrasiyê re zilmên girseyî didomin. Lêkolîn li ser 30 welatên ku di sala pêş de herî zêde kuştina 1000 hezar kesan ji xwe re kiriye hedef hatiye kirin.

Bi rêjeya ji sedî 30,9 Komara Kongoyê ya Demokratîk di rêza pêşîn de ye û Tirkiye jî di rêza 8'emîn de cih digire. Piştî Afganistan, Misir, Sûdana Başûr, Pakistan, Yemen û Angolayê Tirkiyeyê tê. Li gorî daneyên sala 2018-2019'an rêjeya Tirkiyeyê jî sedî 11,2 ye. Sûriye jî di rêza 15'emîn de ye.

Ev Projeya Hişyarkirina Zû di sala 2011'an de hate destpêkirin. Proje daneyên heya yê berfireh kom dike û li welatên cihanê riska hovîtîyên girseyî dinirxîne. Daneyên li ser hewldanên darbeyê, astên otorîteriyê û cinayetên siyasî jî tînin komkirin. Rêveberên projeyê wiha anîn ziman "Dema em li ser qirkirin û hovîtîyên girseyî dixebitin, em dibînin ku tu carî jixweber pêk nayên. Her tim hin nişane derdik-evin holê. Heke ev nişane werin tespitkirin û ji bo pêşgirtina wan hin stratejî bikevin meriyetê em ê dikarin bi jiyana gelek kesan rizgar bikin."

BRUKSEL



Metirsiya qonaxa sêyemîn heye

Serokê Hevpeymanîya Niştîmanî ya Iraqê Eyad Elawî jî rojanameyek Îmaratê re ragihand ku serkeftina li dijî DAIŞ'ê ne çare ye, lewra qonaxa sêyemîn a terorê dest pê dike ku ew jî li dijî armançên aborî û civakî ye.

Eyad Elawî jî rojanameya Beyan a Îmaratê re wiha got: "Qonaxa nû ya terorê jî tevlihevbûna rêbaza DAIŞ û El Qaideyê ye û tê pêşbînîkirin ji Iraq, Sûriye, Afrîqa û Afganistanê der-

keve." Elawî got ku tenê serkeftina leşkerî ya li dijî DAIŞ'ê ne çareserî ye û wiha anî ziman: "Mebesta me jî aştîyê ew e, yekbûna civakê, pêkanîna aştîya niştîmanî û çaksaziyên di warê aborî, civakî û siyasî de ye û welêt digihîne dewleta welatîbûnê. Divê ked bîn dayîn da ku qonaxa sêyemîn a terorê demekeve."

Eyad Elawî her wiha ev tişt gotin: "Ev qonaxa nû ya terorê dibe li dijî



armancên aborî û civakî bikeve tevgerê da ku rewşeke aloz û tevlihev derbibeve." **BEXDA**


'Bi saya kurdan bi ser ketin'

Li gor nûçeya rojnameya Jerusalem Post a Îsraîlê Wezîra Dadê ya Îsraîlê Ayelet Şaked ji radyoya artêşê re axivî û wiha got: "Vekîşîna hêzên Amerîkayê yê jî Sûriyeyê de hêz bibe serokomar Erdogan û zirarê jî bigehîne Îsraîlê."

Şaked amaje bi hêzên kurd ên li rojavayê Kurdistanê kir û got: "Ez hêvîdar im kurd di şerê li hemberî tirkan de serkeftinê bidest bînin. Her wiha hêvîdar im civaka navneteweyî pêşî li Erdogan bigire ku kurdan qetil neke."

Wezîra dadê Îsraîlê diyar kir kur biryara vekîşîna hêzên Amerîkayê jî bo Îsraîlê gaveke xirab e û wiha got:

"Serokê Amerîkayê dostekî mezin e Îsraîlê ye, lê ev gav xizmetê jî peywendîyan re nake, hêz dide dijminê cihûyan, Erdogan." Ayelet Şaked her wiha destnîşan kir ku vekîşîna leşkerên Amerîkayê de bibe sedem ku Îran ji Hizbullah Lubnanê re çekan rê bike û ev tişt gotin: "Kurd qehremanên mezin in. Bi saya kurdan di tekoşîna li dijî DAIŞ'ê de serkeftin pêk hat. Ew hevpeymanên me ne. Hêvîdar im di şerê li hemberî Tirkiyeyê de jî serkeftî bin. Hêvîdar im, civaka navdewletî nehêle Erdogan kurdan bikuje." **QUDS**



Di navbera Îran û Talîbanê de danûstandin tînin kirin



Hate ragihandin ku rejîma Îranê bi Tevgera Talîban a Afganistanê re danûstandina dike.

Li gorî ajansa nûçeyan a Tasnîmê Sekreterê Konseya Bîlind a Ewlekariyê ya Neteweyî Ali Şamhanî gotiye ku der barê danûstandinên bi Talîbanê re hikûmeta Afganistanê hatiye agahdarkirin û hat diyarkirin ku ev pêvajoyê dê bidome.

Der barê cih, dem û naveroka danûstandinan de agahî nehatin dayîn. Li gorî Tasnîmê ya ku girêdayî Muhafîzên Şo-

reşê ne, Şamhanî di serdaneke Kabûlê de rayedar ji hevdiîna bi Talîbanê re agahdar kiriye. Rayedarê Îranê tînkildarî mijarê wiha got: "Komara Îslamê li herêmê bûye stûnekî îstîqrarê. Hevkariya di navbera her du welatan de ew ê karibe kêşeyên ewlekariyê çareser bike."

Di navbera Talîban û Amerîkayê de jî danûstandin didomin. Civîna herî dawî li Emîrtiya Ereban a Yekbûyî hate kirin. Li gorî nûçeyê ajansa Wamê ya di 19'ê kanûnê

de Talîbanan li Abû Dabîyê diyar kirine ku di warê guftûgoyan de 'encamên şênber û erênî' bi dest xistine. Li gorî nûçeyê Erebestana Sîudî û Pakistan jî di civînê de amade bûne. Hatibû ragihandin ku ev civîn di hewldana dîplomatîk a Washingtonê de hatiye kirin. Peywirdarê DYA'yê yê jî bo aştîya Afganistanê Zalmay Halilzad diyar kiribû ku ji bo teşwîqkirina diyalogê û bidawîkirina şer ev civîn hatiye lidarxistin. **BRUKSEL**

Li Îranê otobusa xwendekar tînin de bûn qeza kir: 10 kes mirin

Li paytexta Îran Tehranê, li herêma kampuseke yek ji zanîngêhên herî mezin, otobusekê qeza kir. 10 kes jî ber qezayê mirin.

Li gorî medyaya Îranê, otobuseke ku 30 xwendekar tînin de bûn li herêmeke çiyayî ya kampusa Zanîngeha Îslamî ya Azad qeza kir. Hate ragihandin, otobus li stûnekî ji betonê ketiye.



Li gorî televîzyona Îranê 7 kes li cihê bûyerê mirine. Ajansa Tasnîmê jî ragihand ku hejmara kesên mirine 10 e.

Zanîngêhê berpirsariya qezayê xist stûyê ajokar. Lê belê di medyaya civakî de tê gotin, ji ber ku otobus kevn bû û kontrola wê nehatibû kirin, qezayê rû daye. Lîderê olî yê Îranê Ayetûllah Elî Hamaney daxuyaniyêke nivîskî da û jî ber "qezaya trajîk" sersaxî xwest.

Îran yek ji wan welatan e ku qezayên herî giran ên trafikê lê rû didin. Li gorî daneyên fermî par 16 hezar û 300 kes jî ber qezayên trafikê mirin, 336 hezar kes jî birîndar bûn.

TEHRAN

Li Sûdanê herî kêm 37 kes mirin

Rêxistina Lêborîna Navneteweyî (Amnesty International) ragihand ku li Sûdanê herî kêm 37 kes, ji aliyê karbidestên ewlekariyê ve di xwepêşandanên li dijî hikûmetê de hatine kuştin. Hikûmeta Sûdanê hejmara ku sazîyên navneteweyî dide red dike û diyar dike ku hejmara kuştîyan 8 e. Xwepêşandanên li Sûdanê heftiya borî jî ber bihabûna nan destpê kiribûn.

Roja şeşemê jî bi hezaran kesên li Xartum ya paytaxta Sûdanê kom bûbûn bi dirûşmên îstîfaya serokê welat Omer Beşîr ber bi qesra seroktîyê ve meşiyabûn. Karbidestên ewlekariyê xwepêşandaner bi jop û ava şid belav kirin.

Amnesty bang li karbidestên Sû-




danê kir ku "Li şûna kuştina xwepêşanderan bila bo pirsgerêkên aboriyê çareserîyan bibînin". Amerîka, Kanada û Bîrîtanya jî li ser tundûtûjiya li Sûdanê diyar dikin ku ew jî ber geşedanên heya bi fikar in.

Serokê Sûdanê Omer Beşîr di sala 1989'an de bi darbeya leşkerî hat desthilatê û 29 sal in welêt bi rê ve dibe. **HARTUM**

Balafirên Îsraîlê Şam bombebaran kir

Li gorî agahiyan balafirên şer ên Îsraîlê li ser axa Sûriyeyê firiyane û depoyeke çekan a li nêzîkî Şamê bombebaran kirine. Rayedarekî hikûmeta Sûriyeyê jî mediyayê re piştrast kir ku depoyek hatiye bombebar kirin û 3 leşker birîndar bûne. Rayedar diyar kir ku sistemên parastina hewayî yê Sûriyeyê hatine xebitandin û gelek moşekên Îsraîlê li hewayê hatine rûxandin. Ji aliyê Îsraîlê ve der barê êrişê de heta niha de tu daxuyani nehatiye dayîn. **QUDS**





26 herêmanê Çewlîgî de qedexe ame dergkerdene

ÇEWLÎG - Goreyê eşkerayîya Walîtîya Çewlîgî qedexeyo ke xeylî wext o 26 herêmanê merkez û qezayanê Çewlîgî de esto, heta 9ê çileyê 2019î ame dergkerdene. Nameyê herêman: Merkezê Çewlîgî de Ortaçanak, Wareyê Hasarî, Çirî, Girê Hasarî, Feratan, Newala Merdîvenî, Monçu, Horî-

vanîkî- Tahkîmî, Manavî, Koyê Şeytanî, herêma Îlbey, Newala Şeytanî, Sevkarî, Saggoze, Buyukçag, Yeniyazi, Dikpinar, Derman, Şekeranî, herêma Yenibaşak-Doguyelî, Daristanê Kirkoujî, herêma Guneşlik, Gokcedafî, herêma Çomakdere, Daristanê Karacehennemî û Wareyê Akimli yî.

Şima do nêeşkê serkewtişê PKKyî vindarnê

Gerîlayê YJA-STARî yê ke vanê PKK seba şaranê Rojhelato Mîyanênî çimeyê umîd û cuye yo vatî: "Şima se kenê bikerê nêeşkenê rayraşîyayîşê serkewtişî yê PKKyî vindarnê."

Teçrîdo girankerde ke serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî de yeno meşnayîş, dewam keno. 27ê temuza 2011î ra nata avukat, 5ê nîsana 2015î ra nata zî Heyetê Îmralî û teşebusê derbeya 15ê temmuza 2016î ra nata zî keyeyê Ocalanî nêeşkenî şerî pêvînayîşê Ocalanî. Teçrîd raştê xoverdayîşê şarê kurd yeno û şar her timî hemverê teçrîdî de vindeto. Gerîlayanê YJA-STARî teçrîdê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî, şerê Kurdistanî û do gerîlayî 2019 de şerêko senênî bikerê ser o qisey kerdî.

Gerîlaya YJA-STARî ra Jiyanda destpêkê qiseykerdişê xo de wina va: "Tirkîye û Kurdistan de ke nika binê hukmê faşîzmê AKP-Erdoganî de yê bêhûqîyêka pile esta. Şexsê Rayber Apoyî de wazenê ke îradeyê heme şaran bişiknê û teslîm bigirê."

Ma seba Rayberîya xo şer kenê

Gerîlayan ra Dêrsîme zî qiseykerdişê xo de qala azadiya Rayberîye kerde û va: "Mucadeleyê azadiya şarê Kurdî û azadiya Rayberîye girêdayeyê yewbinan î. Ma nînan yewbinan ra ciya nêkenê. Ma do mucadeleyê seba asayîş û azadiya Rayberîya xo bêmben bidomnê."

Amacê înan tasfîyeyê PKKyî yo

Gerîlayêka bine ya YJA-STARî Delîla zî qalîkerdişê xo de bale ante ke hêrişê dagirkerî yê dewleta tirkî yê herêmanê Rojava, Şengal, Xakûrkê û Bradostî ser û wina qisey kerde: "Hemverê Rayber Apoyî de teçrîdo girankerde esto. Bi nê hawayî vanê belkî hemverê PKKyî de netîce bigirê. Amacê înan tasfîyeyê PKKyî yo. Gerîlayê YJA-STARî vanê şima do nêeşkê vernîya rayraşîyayîşê serkewtişî yê PKKyî bigirê."



yîşê serkewtişî yê PKKyî bigirê."

Rojava de ameyî binfinayene

Gerîla Gulane komploya miyanette- weyîya ya 15ê Sibate 1999î arde vîrî û wina va: "Netîceyê nê de 19ê Temmuze de şorişê Rojava vejîya meydan. Hêzê komlokarî cayê destpêkê komlo de Ro-

java de ameyî binfinayene. Rayber Apo yew dilope bi nika biyo derya. Heme şaran rê rayîr ramot."

Biyê zergûn û kok girewtê

Gerîlayanê YJA-STARî ra tewr peynî Evrîme zî qisey kerde û va: "Toximê umîd û azadiyê yê ke hetê Rayber Apoyî

ra ameyê karitene ewro biyê zergûn û kok girewtê. Komlokarî wextêko derg o ke hemverê Rayber Apoyî de teçrîdê girankerdeyî bica anê. Ma sey şar û tîgêrayîş teçrîd qebûl nêkerd, ma do nêkerê. Serra 2019 de ma do teçrîd bişiknê, faşîzmî birinjnê, Kurdistan û Rayber Apoyî azad bikerê." **XAKURKÊ**

Kerdoxan vejêne raşte



Ma seba heme kesan edalet wazenî

7 serrî verê cû dewa Roboskî ya qezaya Qilabanî ya Şîrnexî de zafê înan doman 34 kesî seba pereyê nanê xo, seba telefonêke û şîyayeyê wendegehî şîyî sînor û netîceyê bombardumanê teyarayanê şerî yê dewleta tirkî de ameyî kiştiş. 28ê înan eynî keye ra pêro piya 34 kesî bi bombayan ameyî qetilkerdîş. Nê kesan ra yew zî Osman Kaplano ke piyê 5 domanan bi yo.

Mektuba ke serê nameyê Osmanî hetê Platformê Edeletî yê Roboskî de ame nuştîş wina ame vatîş: "Ez bawer a ke kes nêbiyo şahidê ke mi cil û belgêke newe dayê xo ra. Sey ke şima fehm kerd ke ez zaf feqîr biya. Hem zî zaf. A şewe ê bombayê ke kewtê serê ma, keyeyê ma tewr feqîr kerd. Nika domanê mi hem feqîr û hem zî bê pî yê." Derheqê ba-

bete de kênayê Kaplanî ra Hulya û cinîya ci Pakîze Kaplane qisey kerdî.

Wa sûcdar bêrê cezakerdiş

Hulyaya va: "Wexto ke piyê mi cuya xo vindî kerd, ez qij biya. Mi zaf piyê xo ra hes kerdene. Wexto ke piyê mi ame qetilkerdîş, ma şî cayê hedîse. Ma nêzana ma sebikerê. Dejê ci hema zî sey roja yewin zaf teze yo. Ez zaf bêriye ey kena. Gorê piyê mi nêzdiyê ma yo. Ez vana qey her wext verê ma de yo. Ez seba piyê xo û heme kesan edalet wazena." Cinîya ey Pakîze Kaplane zî wina va: "7 serrî yo ma pey dewaya xo yê. Dosya şî Ewropa, la ame redkerdiş. Ma wazenê suçdar bêrê cezakerdiş. Wa kes şehidê Roboskî xo vîra nêkero. Ma wazenê ke sûcdarî bêrê cezakerdiş." **ŞIRNEX**



Karo ke her roje yeno kerdiş; pakîya mayînan



Badê ke DAIŞ hetê şervananê Hêzê Sûriyeya Demokratîke (HSD) ra Reqqa ra ame vetîş, bi hezarn mayînan tax, mekteb, awanî, keye, nêweşxane û pêroyê bajari de xo dima vera dayî. Koma wedarnayîşê mayînan waştîşê hemwelatî û hêzê leşkerî pê ana û wexto ke malumat bêra dayîş, şona cayê mayînan. Tena aşma pêyên de koma muhendîsan ke 16 keyeyê taxa Reqqa, 19 cayê pêroyî û 4 mekteban de pakîye kerde û pêro piya 72 mayînan, 39 roket, 2 bombe û 14 mayîne binerdî îmha vete.

Wexto ke mayîne binerdî yenî dîyayîş, seba vetîşî muracatê Komîteya Zerre ya Meclîsê Sivilî ya Reqqa û Komîteya Zerre yena kerdiş. Koma muhendîsan û komîte waştîşê hemwelatîyan pê anî û heme nuqtayan de pakî kenî. Xalid El-Ehmedo ke endamê koma wedarnayîşê mayînan de yo dîyar kerd ke heta ke mayîni bi temami nêri pakikerdiş karê înan do dewam bikera. Kome wextê wedarnayîşê mayînan de heta nika 4 şehîdan daya. **REQQA**

heqê prosesê huqûqî de qisey kerd.

Heme çi destê huqûqnasan de yo

Encu qiseykerdişê xo de wina va: "Bi serrano keyeyê Roboskî seba edaletî tîkoşînan danî. Herinda muhakemekerdişê kerdoxan de ma yenî muhakemekerdiş. Selahiyetdarî seba ke dosya bigirî muracatê her tewir çîyan kenî. Heta nika cayo ke ma nêşîyî û ma muracat nêkerdî nêmendî. La ti netîceyêk nêame girewtîş. Umîdê ma MHME bî, la o zî dejê ma newe kerd. Ma avukatane baroya Şîrnexî û Nuşîrevan Elçîyî reyde pêvînayîşan kerd. Timî ma rê vatene 'ti kêmasî çin o. Ma paweyê qerarê muhakemekerdişî yî.' La xeletîyêka tarîxî kerdî. siyasetmedarî zî zêde muhimî êdayî dosya. Çîyo ke dewlete bi ma kerde baro zî kerde. Ma paweyê xorexnekerdişê siyasetmedar, Nuşîrevan Elçî û avukatane î. No merhela de seba muhakemekerdişê kerdoxan heme çi destê huqûqnasan de yo." **ŞIRNEX**

Seba ke va 'Tîya Kurdistan o' ame

Îşkencekerdiş

Qezaya Erdîşî ya Wanî de Hakan Aydemîro 29 serrî ke hetê psikolojî de baş niyo, seba ke lepatêk da wezîfedarê bankaye û va 'Tîya Kurdistan o' ame îşkencekerdiş. Aydemîrî mudîrî de heta serê sibayî ame îşkencekerdiş. Aydemîro ke bedenê ci de herindê îşkenceyî estî, dîyar kerd ke polîsan ci rê vatî 'Tîya kam ca yo?' û her ke o zî vato 'Tîya Kurdistan o' polîsî îşkence bi ci ameyokerdiş. Sewbîna keyeyê Aydemîrî muracatê Serdozgerîya Komarî ya Erdîşî kerd û polîsan gere kerd.

Aydemîrî va: "Ez seba kartê xo şîya banka. Mi şîfreyê kartê xo xo vîra kerd û mi wezîfedar rê şîfreyê xo pers kerd. O zî va 'do mesaj bêro telefonê to.' Mi zî va 'telefonê mi çin o.' Ez banka ra vejîya ya û dima ra reyna şîya banka. Mi reyna şîfre pers kerd. O zî va 'ma nêeşkenê çîyêk bikerî.' Dima ra mi lepat da pîro û mi va 'Tîya Kurdistan o'. Badê hedîse mi berdî mudîrî. Binê çîman de waştî ke ez Merşê İstiklalî biwîna. Mi nêwend û mi kutî. Wexto ke ez şîya banka mi înan rê ma psikolojîyê mi baş niyo, la mi esas nê-girewtî. Îşkence bi mi kerdî." **WAN**





Bersiv helbesta Arjen Arî ye

Nivîskar Yildiz Çakar got weke ku Arjen Arî jî gotî di qada şer de piştta me negihîşt erdê, di qada wêjeyê de jî tu xerabî de negihîje armanca xwe. Organizatorê pêşbirkê Reşo Ronahî jî diyar kir ku lijneya wan jî piştrast kiriye ku çend helbestên Yukler werger in û pêwîstî bi betalkirina pêşbirkê nedîtine

Kadrî ESEN / AMED

Helbestkarê kurd ê gewre Arjen Arî ku bi hezaran helbest ji wêjaya kurdî re gihand di 30'yê cotmeha 2012'yan de çû ser dilovaniya xwe. Salek piştî wê dilovaniyê ji aliyê rojnemaya Evrenselê ve ji bo biranîna helbestkarê gewre Pêşbirkê Helbesta Arjen Arî hat organîzekirin. Ji sala ku dest pê kiriyê heta niha ev pêşbirk 6 car in bê navber tê organîzekirin. Herî dawî beriya çend rojan ji aliyê organizatorê daimî yê pêşbirkê Reşo Ronahî ve pêşbirk 6'ê min jî hat ragihandin.

Pêşbirk ji ber ku bi zimanê kurdî tê organîzekirin, kesên ku beşdarî pêşbirkê dibin jî tenê dikarin bi helbestên xwe yê ku bi kurdî nivîsandine beşdarî pêşbirkê bibin. Lê li gel wê yekê jî di pêşbirk 4'ê min a sala 2017'an de ev şert hatiye binpêkirin. Narîn Yukler bi helbestên xwe yê ku ji tirkî wergerandine kurdî beşdarî pêşbirkê dibê û ji aliyê lijneya (Kawa Nemir, M. Çiya Mazî, Gulîzer, Necla Arî) pêşbirkê ve hejîyê xelatdayîne tê dîtîn.

Bi belgeyan ragihand

Ev binpêkirin heta ku nivîskara me Yildiz Çakar di mehên havînê de derxist holê û li ser hesabê xwe yê twitterê parve kir jî ji aliyê tu kesî ve nedihat zanîn. Lê li gel wê yekê jî organizatorê pêşbirkê Ronahî roja ragihandina pêşbirk 6'ê min ew yek red kir. Ronahî ragihand ku lijneya wan a pêşbirk 4'ê min mijarê lêkolîn kirine û tespît kirine ku helbestên Narîn Yukler bi zimanê kurdî hatine nivîsandin û ji aliyê tu kesî ve nedihat zanîn.

kesî ve nehatine wergerandin.

Li ser wê yekê nivîskara me Çakar li ser hesabê xwe yê twitterê bi belgeyan organîzator û lijneya pêşbirkê derewand. Çakar ji ber helwesta wan organîzator û lijneya pêşbirkê şermezar kir û helbestên Narîn Yukler ên tirkî ku ji bo pêşbirkê li kurdî hatine wergerandin weşandin. Çakar xwest ji bo hurmetdayîna ji Arjen Arî û baweriya pêşbirkê re pêşbirk 4'ê min bê betalkirin û xelata ku Narîn Yukler ji ber helbestên xwe yê wergerê wergirtiye, jê bê standin.

Destpêkê ew pîroz kiriye

Nivîskara me Çakar pirsên me yê têkildarî mijarê bersivandin û mijarê zelaltir kir. Çakar diyar kir ku 4'ê min Pêşbirkê Helbesta Arjen Arî di mehên nisana 2017'an de bi encam bûye û wiha got: "Di wê pêşbirkê de Xelata Arjen Arî bi dosyaya 'Rê û Rêç' Narîn Yuklerê wergirt. Dema xelat girt a ku ewil ew pîroz kir yek jê ez bûm û beriya herkesî min ew pîroz kir. Heta wê çaxê min yek helbesteke wê li tu cihê nexwendibû û der barê nivîsandina wê de fikreke min tunebû. Berken Bereh jî di lijneyê de bûye lê ji ber çî sedemê me nizanim xwe ji lijneyê vedikişîne."

Çakar anî ziman ku piştî pêşbirkê salek şûnde bi tesadufî ji nivîskar û helbestkar Nûdem Hezexî hîn bûye ku Narîn Yukler bi kurdî nizane û ev tişt gotin: "Ez şaş mam. Min got ev çawa dibe? Got ji min rica kiriye ku alikariya wê bikim. Lê min jî xapandiyê. Min got çawa? Got Narîn Yukler bi wergera min beşdarî pêşbirkê Arjen Arî bûye. Halbûkî herî dawî ji min re gotibû min wergera te avêtiye min bixwe helbestên xwe wergerandine û şandine pêşbirkê."

Parvekirinê asteng kirine

Çakar destnîşan kir ku Yukler di rastiyê de bi wergera Hezexî beşdarî pêşbirkê bûye û ev tişt anî ziman: "Paşê Nûdem Hezexî her sê dosyayên Narîn ên bi tirkî û yê ku Narîn wergerandine ew û wergerên ku ew bi xwe kirine ji min re şandin (Tirmeha 2018). Dema van belgeyan ketin destê min, min sergirtî nivîsek nivîsand ku Narîn Yukler helbestên xwe yê wergerên jî tirkî wê xelatê girtiye, tişt a ku li gor qeydên dinyayê û



etîka wêjeyê bike ev e; lêborîne bixwaze û xelatê dişa şûnve bide."

Çakar di berdewamê got ku piştî nivîsa xwe ya sergirtî hemû belgeyan ji M. Çiya Mazî û berpirsê pêşbirkê jî Reşo Ronahî re şandine û wiha domand: "Di wê navberê de berpirsê pêşbirkê Reşo Ronahî hem bi e-mail hem jî bi telefonê ji min daxwaz kir ku ez van belgeyan parve nekim û di axaftina xwe ya bi min re got tu heta dawiyê mafdarî ji ber ku xelata Arjen Arî ne ji wergerê re ye, ji helbesta kurdî re ye. Em ê xelatê jê bigirin û pêşbirk 4'ê min a 2019'yan de bibêjin xelatê sala 2017 betal bûne."

Çakar bal kişand ser helwesta Narîn Yukler jî û têkildarî mijarê ev tişt gotin: "Narîn Yukler jî li ser hesabê xwe yê facebookê daxuyandibû ku 7 helbestên xwe wê bi xwe wergerandine (Dosyaya xelat girtiye hemû ji aliyê Nûdem Hezexî ve hatine wergerandin ku di vir de jî Narîn Yukler dişa rast nabêje, lê piçek li xwe mikur tê ku dibêje hinek jê werger in). Yukler bi dosyaya xwe ya wergera jî tirkî ne tenê beşdarî pêşbirkê Arjen Arî dibe, bi wergera pirtûka xwe ya bi tirkî beşdarî Pêşbirkê Çarçirayê ya Rojhilat jî dibe. Lê li rojhilat encam jî pêşbirkê demakeve."

Dê wêjeya kurdî negihîje erdê

Çakar da zanîn dema ku pêşbirkê çêbibe divê asteke lijneyê hebe ku bizanibe ka ew berhemên hatine ber destê wan diziyê, werger e, baş e, nebaş e û xelet e û dirêji da axaftina xwe: "Ger ev

ast li ba lijneyê tune be dê raya giştî were xapandin û qada wêjeyê jî were herimandin. Ev bûyera ku niha qewimiye bi me dide nîşandan ku ka kî li ser navê wêjeya kurdî biryar dide û çawa avê şolî dike. Li cîhanê di gelek pêşbirkan de hinek kes lijneyan xapandine, dema belgeyek derdikeve holê, li gorî belgeyan kar û bar tê kirin û pêşbirk betal dibe, xelat şûnve tê wergirtin. Lijne jî lêborîna xwe dixwaze û mijar û bûyer pir bi zelalî tê girtin. Lê ev lijnê li gel ku hemû belge li rastê ne jî dixwazin ser ve mijara genî bigirin."

Çakar got ku lijneya mohreke reş ya xerabiye li helbesta kurdî xistiye û ev tişt anî ziman: "Ji bo dawa xwe ji agir xelas bikin helbest û zimanê kurdî avêtine nav agir. Loma jî tu rasteqîniya ve pêşbirk 4'ê min ji aliyê Weşanên Evrensel-Sorê ve hatiye lidarxistin nemaye. Kesek nizane bi kurdî lê bi zorê dixwazin wê bikin nav qada wêjeya kurdî. Weke Arjen Arî gotî di qada şer de piştta me negihîşt erdê di qada wêjeyê de jî tu listik, proje, xerabî de negihîjin armanca xwe û dê tu kes nikaribe rêya ava zelal bigire. Ger şahid divê va ye helbesta Arjen Arî, va ye Cegerxwîn va ye helbesta kurdî va ye ev ax!"

Helbest werger in

Me xwe gihand organizatorê pêşbirkê Reşo Ronahî û belgeyên ku Yildiz Çakar weşandine jê jî pirsî. Ronahî hema bêje daxuyaniya xwe ya roja ragihandina pêşbirk 6'ê min dubare kir û ev tişt anî ziman: "Min

beriya niha jî gotibû û niha jî bibêjim. Me belgeyên Yildiz Çakar û daxuyaniya Narîn Yukler ên beriya niha ji lijneya pêşbirkê re şandin. Lijneyê piştî nîqaşên di navbera xwe de diyar kir ku çend helbestên Yukler li kurdî hatine wergerandin."

Ronahî diyar kir ku lijneyê ji wan re ragihandiyê ku Yukler jî qebûl dike ku çend helbestên xwe jî tirkî wergerandiyê kurdî û wiha got: "Lijneyê diyar kir ku Yukler di helbestên xwe de serkeftî ye û pêwîstî nake ji bo çend helbestên wergerandî pêşbirkê betalkirin û xelata Yukler jê bê standin. Em jî li ser wê yekê wek organîzator nikarin tiştêkî bikin. Dê têkildarî mijarê malbata Arjen Arî jî daxuyaniyekê bide çapevaniyê."



Helbestkar Dogan bû mêvana Koma Helbestê ya Amedê

Koma Helbestê ya Amedê ku ji du hefteyan carekê li Amedê kom dibe û helbestkarên ku bi zimanê kurdî helbestana dinivîsin dike mêvan, wê hefteyê helbest-

kar Nezahat Dogan kir mêvan. Helbestkar Nezahat Dogan ku xwediyê de berhemên bi navê 'Çiroka Emrê Min' û 'Demsalên Şikestî' ye got ku xizmeta ji bo zimanê da-

kiyê û helbestên kurdî ji bo wê şanazî ye.

Helbestkar Dogan di berdewamê de diyar kir ku hemû berhemên xwe bi zimanê kurdî nivîsandine û wiha axivî:

"Helbestên min şopa jiyana min in. Min helbesta yekem jî bi zimanê kurdî xwend. Ez di temenekî biçûk de hatim zewicandin û ji Mêrdînê derbasî Qamişloyê bûm. Piştî ku ez şêş mehan li Qamişloyê mam derbasî Swêdê bûm. Min cara yekem di 22 saliya xwe de dema ku keçika min jiyana xwe ji dest da dest bi helbestê kir."

Şevbihêrka Helbest û Muzîkê ya Koma Helbestê ya Amedê bi nixandina berhemên Dogan ên 'Çiroka Emrê Min' û 'Demsalên Şikestî' û bi stranên hatin gotin bi dawî bû. AMED



Şanoya Bajêr a Amedê atolyeya dramayê vedike

Şanoya Bajêr a Amedê xebatên xwe didomîne. Şanoyê heta niha gelek şanogerên ciwan gihandiyê û niha jî hewl dide ji bo zarokan atolyeya dramayê veke û ji bo mezinan jî dersên şanoyê bide. Ji bo atolyeya dramayê û dersên şanoyê heta niha gelek kesan serî li Şanoya Bajêr a Amedê daye.

Wê xebatên atolyeyê û dersên ji bo şanoyê di sala nû de dest pê bikin. Wê perwerdehî hefteyê 6 saet bin û dê hefteyê 4 saetan darsa listikvaniyê û listikvaniya sereke bê dayîn û 2 saetan jî darsa dîroka şanoyê û raçavkirina listikan bê dayîn.

Ji derhênerên Şanoya Bajêr a Amedê

Nazim Hikmet Çalişkan diyar kir ku armanca wan a bi atolyeya dramayê ew e ku zarok hay ji wê formatê hebin û bi dersên şanoyê jî armanca wan ew e ku êdî kesên gihandî jî hêla dikê ya şanoyê hay ji metbaxa vî tiştî jî hebin. Çalişkan da zanîn ku heta niha gelek kesan serî li wan daye û ew ê piştî perwerdeyê û atolyeya dramayê listikê amade bikin. AMED

